Newroz Hejmar (73) Rûpel (13) Nîsan 2006z – 2619k

Sersal û çarşema pîroz

Wekî ku nas e, çarşema yekê ji meha Nîsana Şerqî, li ba Êzdiyan cejna Sersal û Çarşema pîroz e. Ew îsal ket roja 18 ê meha Nîsana Xerbî.

Wekî ku avsana Êzdî ya olî dibêje, di wê rojê de, hezretî Tawûs Melek serokê heft pêriyên mezin, ji Erşan dadikeve erdan û li rewşa miletê Êzdî dipirse. Ji ber wê jî Êzdî xwe ji wê rojê re amade dikin, cilên paqij û fodil li xwe dikin, derdikevin ber pîrozgehan, qurbanan dikin û şahiyan li dar dixin.

Îsal bi sedan Êzdî, digel gelek Kurdhez, di şahiyên cejnê de beşdar bûn û ew pîroz kirin.

Cejin li sê deran hate şên kirin. Li serê çiyayê Parsê li ber pîrozgaha Parse Xatûnê. Li çiyayê Lêlûn li ber pîrozgeha Çêlxanê. Û li ber girê Endarê. Aheng bi def, zurne û stiran li dar ketin. Hin stranbêjên naskirî mîna Elî dawûd û sazbendên hêja jî lê beşdar bûn. Bi hunera Kurmanciya ciwan û bêhna gul û kulîlkan ji pêşwazî li hezretî Tawûs Melek kirin û cejin pîroz kirin.

Li Endarê, Şêx Mihemedê Kalo ji gundê bircê çend Qewlên olî gotin û bala beşdaran bir ser rewşa ola Êzdî.

Li Çiyayê Parsê, roja Sêşemê 17ê mihê, gava ciwanan dora pîrozgehê dimala, peyayên asayişên navça Ezazê hatin çar ciwanên 14 ta 17 salî girtin û roja din rakirin Helebê û ta roja nivîsandina vê nûçeyê hîn girtîbûn û.

Rewşa ean nediyar bû



Mirov dipirse, kîjan ehmaqa kane bêje, baxçê bi gulên ji rengekî ciwantir e. Ji kûraniya dîroka mirovatiyê de mafên olbawerî û Xwedêparêziyê hene û rewa ne. Bi girtin û zîndankirinê ne raman dimirin û ne ol tên windakirin, li bervajî wê olbawerî tund û hişk dibin û mirov ditirse ku hemî gulên wî baxçî dibin xwe de bipelêxe. Lê em niha ne li wê ne.

Birastî, rêwresmên cejna Çarşema pîroz bi şêweyekî pir baş û şaristanî hatin lidarxistin. Reng û dengê gelê Kurd ên ji hezar salan ve zindî mane hatin dîtin û bihîstin. Em hêvîdar in rêwresmên vê cejna her sal werin lidarxistin, wateyeke civakî ya sinciyî û pêşverû bistîne û xelkê me yê Êzdî jî di xêr û xweşiyê de bin.

Em bi navê rojnama «Newroz» cejna Sersala Êzdî û Çarşema Sor pîroz dikin, û bextewarî û serkeftinê ji gelê xwe re dixwazin

Dumaha:Serfrazî… Ji dil û can em lidarxistina konferansa we pîroz dikin , serkeftinê jê re dixwazin , bi hêviya ku hemî heval û şaxên rêxistina Ewropa ya partiyê , bêtir li pirsa gelê xwe xwedî derkevin , siyaset û helwestên parta xwe , bi dilsozî biparêzin û bibine dengekî xweş , bilind û hêja , di pêvajoya xebata kurd de li welatên xerîbiyê

Serfirazî û pêşkeftin ji kar û barê konferansa we ya pîroz re

Bijî xebata gelê me yê kurd li Sûriyê bona Aştî , Azadî û wekheviyê .

Sipas ji guhdariya we re .

Komîta birêvebir ya partiya yekîtî ya demokrat a kurd li sûriyê – Yekîtî –

Pêşiya Gulana – 2007 –an